

Dibistana  
swêdî ji bo  
kesên nûhatî

Nordkurdiska




Ji bo ciwanên 16–20 salî

**Lîse**



*Skolverket*

# Dibistana swêdî ev e



Zaroka te dikare ji roja ku 1 salîya xwe tije dike biçê pêşdibistanê. Li pêşdibistanê lîstin girîng e. Dema zarok dibe 6 salî dikare dest bi sinifa pêşdibistanî bike. Çûna hem pêşdibistan û hem jî sinifa pêşdibistanî bi dilxwazî ye.

Hemû zarok ji 7 salî û pê ve diçin dibistana bingehî ya ku mecbûrî ye. Erka dibistanê ji bo sinifên 1-9 derbas dibe, yanî neh sal

Piranîya ciwanan pişt re sê salen din jî diçin lîseyê. Kesên nû hatine Swêdê xwediyê wî mafî ne ku piştî wergirtina destûra rûniştinê ya daîmî hetanî dawîbûna wê dewreya buharê ya ku temenê 20 salî tije dikan dest bi lîseyê bikin; penaxwaz jî beriya 18 salîya xwe tije bikin. Lê ji bo notên pejirandî hîn şert tene ferz kirin. Lîse şagird hem amadeyê zaningeh û dibistana bilind û hem jî xebata yekser dike.

# Lîse amadeyê kar yan jî xwendina bilind dike

**Lîseya swêdî bi dilxwazî ye.** Lê tevî vê jî hema hema hemû şagird piştî dibistana bingehî bi lîseyê xwendina xwe didomînin. Bi vî awayî ciwan xwe amadeyî xwendina bilind yan jî xebata yekser ya li piştî girtina dîplomaya lîseyê dikin.

Lîse ji bo gelek kesan sêsalî ye. Piraniya şagirdan yekser piştî dibistana bingehî dema 16 salî ne dest pê dikin. Xwendina lîseyê gerek e herî dereng wê sala berî ku mirov 20 salî tije bike dest pê bike. Kesên bi temenê ji vî bilindtir dikarin perwerdeya lîseyê ya salmezinan bixwînin.

Ciwanên bi anormalîyeke pêşkeftinî ku nikarin xwendina xwe di lîseyeke asayî de bikin dikarin biçin Lîseya perwerdeya taybetî. Di derbarê Lîseya perwerdeya taybetî de di broşûra wê ya cihê de bixwîne. Xwendina li lîseyê bê pere ye (belaş e). Ev tê wê maneyê ku şagird ji bo perwerde, kiteb û materyalên dibistanê pere nade. Ji hêla din ve mafê dibistanan heye ku ji bo xwarina dibistanê pere bigire. Mafê hemû şagirtên diçin lîseyê ya wergirtina alîkarîya aborî ya perwerdeyê (studiebidrag) heye.



# Hilbijartinek di nav 18 programên lîseyê de

**Hijdeh programên netewî yên lîseyê** hene ku mirov dikare ji nav wan yekî hilbijêre. Diwazdeh ji wan programên pîşeyî ne. Ev tê wê maneyê ku ji bo şagirt karibin yekser piştî wergirtina diploma lîseyê dest bi xebatê bikin perwerdeyêke temamî ya pîşeyî werdigirin. Ew şeş programên din şagirt amadeyê xwendina berdewamî ya li zanîngeh û dibistana bilind dikin.

Tu yê ku çûyî programekî amadekarîya dibistana bilind bi awayeke otomatîkî mafdarê xwendina li dibistana bilind dibî. Lê hîn ji perwerdeyên dibistana bilind di hîn dersan de wergirtina notan ferz dikin. Ji vê re dibêjin mafdarîya taybetî. Kesê ku programeke pîşeyî xwendîye dikare wan kursên swêdî û inglîzî ku mafdarîya bingeîn ya ji bo xwendina li dibistana bilind dide bixwîne.

## 18 programên li lîseyê

### Programên pîşeyî

- Programa zarok û dema vala
- Programa avakarî û tesîsan
- Programa elektrîk û enerjîyê
- Programa wesayît û neqlîyatê
- Programa bazirganî û îdareyê
- Programa karê destan
- Programa hotel û tûrîzmê
- Programa teknîka endustrîyê
- Programa sanayîya xwezayê
- Programa restorant û tiştên xwarinê
- Programa VVS û avahîyan
- Programa tendrûstî û lènêrînê

### Programa amadekarîya dibistana bilind

- Programa aborîyê
- Programa estetîkê
- Programa ziman, felsefe û dîrok
- Programa zanistîya xwezayê
- Programa zanistîya civakê
- Programa teknîkê

Her weha perwerdeyên din jî hene, weke mînak perwerda sporê. Wekî din ji bo şagirtên ku ne mafdarê xwendina li programeke netewî ne programên amadekarîyê hene.

## Şertên destpêkirina lîseyê

**Ji bo destpêkirina lîseyê** pêwîst e ji hejmarek dersên ji dibistana bingeîn notên pejirandî wergirî. Hemû programên lîseyê ferz dikin ku mirov ji dersên swêdî yan jî swêdî weke zimanên dûem, inglîzî û matematîkê nota pejirandî wergire.

Ji bo programeke pîşeyî pêwîst e kêmasî ji pênc dersên din û ji bo programeke amadekarîya dibistana bilind jî kêmasî ji neh dersên din nota pejirandî wergirî.

# Perwerde weha hatîne pîlankirin

## Perwerdeya li lîseyê ji beşên cûda pêk tê

- Hin ders ji bo hemû bernamayan hevbeş e. Vana inglîzî, dîrok, spor û tendrûstî, matematîk, zanebûnên xwezayê, zanebûnên olî, zanebûnên civakî û swêdî yan jî swêdî weke zimanê duyem in.
- Şagirt her weha çend dersên ku eleqa xwe bi bernama hîlbijartine re heye jî dixwînin. Wekî din di her bernamê de kursên lêkûrbûna bernamê jî hene.

- Şagirt di dawîyê de hîlbijartinên şexsî dike. Weke mînak mirov dikare dersên ku piştî lîseyê derfeta xwendina bilind dide hîlbijêre

Tu yê ku programeke pişeyî dixwîni pîranîya dema perwerdeyê li dibistanê derbas dikî. Lê hetanî nêzî nivê perwerdeyê jî dikarî xwendina xwe li kargehekê jî pêk binî. Lê heger dixwazî pîranîya dema perwerdeyê li kargehek derbas bikî wê demê jê re dibêjin Perwerdeya lîseyê ya çiraxîyê.



## Qarne û dîploma

**Şeş dereceyên notan hene:** A, B, C, D, E û F. A nota herî bilind e û E ya herî nizim ya ji bo pejirandîbûnê ye. F nota "ne pejirandî" ye. Piştî her kursekê tu not werdigirî.

Şertên zanebûnê yên dibistanê hene ku nîşan didin ka gerek e şagirtek bi kêmasî çiqasî tişt hîn bibin. Ev şert ji bo hemû dibistanên Swêdê wekî hev in. Not bi muqayesekirina zanebûnên şagirdên din yên li sinifê nayên dayîn lê belê li gorî şertên zanebûnê yên her kursekê tene dayîn.

Berî destpêka her kursekê gerek e mamoste dîyar bike ka şertên ji bo notên cûda yên wê kursê çi ne. Weke şagirdek mafê te heye ku dema kurs dajo ji mamoste pirsîyar bikî ka rewşa te di çi astî de ye. Dema te not wergirt êdî derfeta îtirazkirinê tune ye.

Perwerde bi xebateke lêkolînî ya lîseyê bi dawî dibe. Weke şagirt tu wan tiştên hîn bûyî bi rêya lêkolîneke mezin ya serbixwe bi kinasî radixîni ber çavan. Ji bo tu karibî dîploma xwe wergirî pêwîst e xebata te ya lêkolînî ya lîseyê were pejirandin.

# Qaîdeyên girîng yê li lîseyê

**Mafê her şagirtêkî heye** ku bi armanca serkeftina di perwerdeya xwe de ji dibistanê alîkarî wergire. Li beramberî vê yekê dibistan jî ji te hêvî dike ku heta ji dest te tê jêhatî bî.

Xwendina li lîseyê bi dilxwazî ye. Lê tû yê ku diçî vê dibistanê gerek e tevî xebata wê bibî. Yanî li dibistanê amadebûn bi dilxwazî nîn e. Kesê ku nexweş dikeve gerek e vê yekê ji dibistanê re rabig-hînin. Şagirtêk ku gelek caran naçe dibistanê dikare

hem cihê xwe yê li lîseyê û hem jî alîkarîya aborî ya perwerdeyî (studiebidrag) wenda bike.

Bi armanca ku perwerde bi awayeke baş were meşandin hîn qaîdeyên nîzamê hene. Mafê her şagirtî ye ku karibe perwerdeya xwe di nav ewlekarî û aramîyê de pêk bîne. Mafê mamoste heye ku şagirtêk ku gelek caran di dersê de acizîyan peyda dike ji sinifê derxîne derve. Di rewşên cidî de hişyarîyeke nivîskî dikarin bidin şagirt.

## Hilbijartina dibistanekê

**Ji bo hilbijartina programek lîseyî** û dibistanekê dikarî ji rêberek xwendin û perwerdeyê alîkarî wergirî. Ev kesan li hemû dibistanan hene, hem li dibistana bingehî û hem jî li lîseyan. Ev kes dikare di pîlankirina te ya jîyana xebatê yan jî perwerdeyekê de alîkarîyê bide te.

Şagirt dikare bi xwe daxwaza çûndina dibistanek li nav yan jî derveyê şaredarîya xwe bike. Şaredarî dibistanên xwe hene, lê her weha dibistanên serbest jî hene. Dibistanek serbest dikare ji aliyê şirketek, weqfek yan jî komeleyek ve were rêvebirin. Hemû dibistan bê pare ne (belaş in) û şertên ji bo zanebû-

nan tên ferzkirin wekî hev in. Ferq nake diçî kîjin dibistana lîseyê, di har halî de mafê te yê wergirtina alîkarîya aborî ya perwerdeyî (studiebidrag) heye. Kesek ku dixwaze biçe dibistanek li şaredarîyek din yan jî dibistanek serbest serlêdana vê li cem şaredarîya lê niştecih e dike.

Serlêdana lîseyê di dewra payîzê ya sinifa nehan de dikî. Qebûlbûneke destpêkî di biharê de pêk tê. Lê qebûla dawî di mehên havînê de çê dibe. Qarneya dewra biharê di qebûlbûna lîseyê de xuyakar e. Ji ber vê yekê baştir e ku mirov ji destpêkê ve serî li hejmarek dibistan û programan bide.



# Şagirt berpirsiyarî digirin û bandorê dikin

**Pêwîst e hemû şagirdên lîseyê** karibin li dibistanê têkildar bin, bandorê bikin û berpirsiyarîyan wergirin. Dibistan gerek e wekî civaka li dora xwe li ser nîrxên demokrasîyê xebata xwe saz bike. Her weha girîng e ku dibistan karê xwe jî bi awayeke demokratîk rêve bibe.

Serê her dewrê (termînê) kêmasî carekê şagirt bi tevî dêûbavê xwe mamoste dibîne û bi wê/wî re li ser perwerdeyê diaxive. Ji vê re dibêjin civîna pêşkeftinî (utvecklingsamtal). Baştir e ku dêûbav jî tevî vê civînê bibin.

Weke şagird derfeta te heye ku tu li ser rêçûna li dibistanê nîqaşê bikî û bibêjî ka tu çiqasî ji dibistanê memnûn û razî yî. Ev civîn derfetê dide te ku tu bandorê bikî û di warê xebata dibistanê de berpirsiyarîya xwe bigirî. Her şagirtek xwedî pîlaneke perwerdeyê ya şexsî ye.

Heger te 18 saliyên xwe tije nekiribin mafê dêûbavê te heye ku di civîna pêşkeftinîyê de cih bigirin. Şagirtên 18 salî tije kirine bi xwe biryarê didin ka bila dêûbavê wan di civînê de hazir bibin yan na.




# Perwerdeya zimanê zikmakî û alîkarîya taybet

**Heger zimanekê te yê zikmakî** yê derveyê swêdî hebe û hûn vî zimanî li malê dipeyîvin wê demê tu mafdarê perwerdeya zimanê zikmakî yî. Şertên ji bo vê ew e ku tu dikarî vî zimanî biaxivî û li kêleka vê derfet heye ku grupek ji kêmasî pênc kesî û mamosteyek minasib karibe were peyda kirin.

Her weha mafê te heye jî ku bi zimanê zikmakî rêberîya perwerdeyê wergirî. Şagirtek ku ji bo karibe li lîseyek bixwîne têra xwe notên serîlêdana lîseyê tune ne dikare biçe programeke amadekarîyê (introduktionsprogram). Weke mînak hîn

programên amadekarîya ziman hene ku derfetê dide wan şagirtên nû hatine Swêdê ku swêdîya xwe baştir bikin.

Şagirtek ku di programeke lîseyî de dixwîne û metirsî heye ku nikaribe nota pejiwandî wergire mafdarê wergirtina perwerdeya taybetî ye. Di wê rewşê de şagirt, mamoste, midûr û dibe ku dêûbav bi armanca ku li ser bernameyêke tedbîran li hev bikin civinek pêk tînin. Di bernama tedbîran de gerek e were nivîsandin ka dibistan bi çi awayî destekê dide şagird û ka divê şagird bi xwe çî bike.



Den svenska  
skolan för  
nyanlända

**Beställningsuppgifter:**

Fritzes kundservice  
106 47 Stockholm  
Telefon: 08-690 95 76  
E-post: [skolverket@fritzes.se](mailto:skolverket@fritzes.se)  
[www.skolverket.se](http://www.skolverket.se)

**Beställningsnr:** 15:1455  
**ISBN:** 978-91-7559-169-8

**Bilder:** Folio, Michael McClain,  
Matton, Johnér, iStock  
**Illustratör:** Helena wHalvarsson

**Grafisk form:** Jupiter Reklam  
**Grafisk produktion:** Space360  
**Översättning:** Space360  
**Tryck:** Lenanders Grafiska, 74088